# Nivêjên Êzîdiyan

Celadet Bedirxan

# Nivêjên Êzîdiyan

**Zerdeşt: Di cîhanê de rêyeke, ew jî rêya rastiyê ye.**

Veguhestina Tîpan:

**Dilawerê Zengî**

**Mafê çapkirin û belavkirinê parastî ye**

Celadet Bedirxan

Nivêjên Êzîdiyan

Veguhestina Tîpan: Dilawerê Zengî

Qamişlo 2017


***

Kitêbxana Hawarê

Hejmar: 5

Çapxana Tereqî

Dîmeşq- 1933


کتێبخانا هاواری

هژمار
٥

# نڤیژین ایزیدیان

دەهانی دەرێ یکە، اوژێ رێ باراسنێ بێ یە : زردشت

QUATRE PRIÈRES AUTHENTIQUES,
INÉDITES DES KURDES YÉZIDIS.

مطبعة الترقي
دمشق ١٩٣٢

# Pêşgotink

Ev kitêboka ha ji bona belav kirina çend Nivêjên Êzîdiyan hatiye çap kirin. Me dil kir ko bi vê hincetê em çend pirsan li ser Êzîdiyan bibêjin. Di heqê van Kurdên esîl û xwerû de heta niho gelek tiştên ne qenc û xerab hatine gotin. Lê di rastiyê de ne welê ye.

Êzîdî ne pûtparêz in, ne jî wek gotinên xelkê ji tiştikê din re parêz in. Êzîdî jî wek miletên din yên Xwedan kitêb xwedêparêz û ji yekîtiya Xwedê re bawer in. Ji wê pêve Êzîdî di Xwedêparêziyê de ji her kesî ji her milet û nijadî kevintir in. Ji ber ko ola Êzîdî bermayeke ola Zerdeşt e. Ayîna wan guhartûyeke ayîna Mizdîsna yanî ayîna

Zerdeşt e û ayîna Zerdeşt di yekparêziyê de ji ayînên din kevintir e.

Berê Kurd hemî Zerdeştî bûn. Ji ayîna Mizdîsna ve nivêj dikirin û ji Xwedê re diparistin, pêşdetir hîn bi hîn bi derketina olên din geh bi dil geh bi zor olên xwe ên kevin şemirandin û olên din himbêz kirin. Hinekan dane pey filetiyê hinan jî pey misilmaniyê. Êzîdî li ser ola xwe sekinîn û ew bernedan. Lê bivê nevê di dewra babilîskan re ola wan di bin hikmên olên din de hin tiştên xwe û navê xwe guhartin û ola Êzîdiyan ket halê xwe ê îro.

Nivêjên Êzîdiyan ne tenê ev in ko em îro belav dikin. Ji van bi gelekî bi bêtir in. Ji xwe di Ayîna Mizdîsna de- ko ji islamiyetê bi çend hezar salan kevintir e- nivêj di rojê de pênc carane.

Îro ev Kurdên esîl di nav me de kêm bûne. Bi kurtî eşîrên Kurdên Êzîdî ev in: Dinan û Sohanî (Amûdê) Çêlkan (Tor Abdîn, Midyat, Nisêbîn) Xaltan (Se'red, Hekarê, Zoq, Botan) Êzîdiyên çiyayê Lêlûnê (Kurdax) Reşikan (Til 'Efer) Hoyrî, Misosanî (Zaxo) Didan, Birînmemê (Duhok û dora Mûsil).

Eşîrên welatê Şêxan: Hekarî, Xetarî, Mawsî, Tirk, Qaêdî, Dumilî, Herekî, Xîskan.

Eşîrên çiyayê Şengarî: Feqîran, Simoqî, Qîranî, Hibaban, Heska, Misqora, Mala Xeltî, Mêrgan, 'Elîfere, Mendikan.

Qederê (50000) Êzîdiyên welatên Qefqas û Rewanê.

*****

Bi vê kirazeyê em çar nivêjan belav dikin. Heke mezin û zanayên Êzîdiyan ji me re çendkên din jî hinartin em wan jî belav dikin.

Ji van çar nivêjan nivêja Spêdeyê ji me re şêx Heyder lawê şêx Nezîr gotiye. Sisiyên mayîn tev de ji devê Ismaîl begê, ji mîrekên Êzîdiyan, hatine bihîstin û nivîsandin. Spas û şabaş ji wan mirovan ra ko xidmeta ol û miletê xwe dikin.

**Celadet Bedirxan**

# Nivêja Spêdeyê

Xwedê ew! Ji bona şanê te, ji bona padşahiya te!

Ya Reb Tu kerîm î, Tu rehîmî, Tu Xwedayî, Tu melekê mulkê cihanî, mulkê sûq û semayî, melekê 'erşê 'ezîmî!

Ya Rebî tu ji enzelda qedîmî! Ya Rebî ta ebed Tu kama rûhayî!

Ya Rebî Tu melekê cin û ins î, melekê 'irş û kursî! Ya Rebî Tu semed û left û nimayî!

Ya Rebî Tu semed û heyulmecîdî yek û yekta û bê enbazî.

Ya Rebî her Tu laiqê medh û senayî!

Ya Rebî Tu Xwedawendê sipherî, Xwedanê mah û mihrî, Xwedanê çem û nehrî!

Ya Rebî Tu Xwedawendê 'edayî!

Ya Rebî te nalûme, te na emdada, te na awaza, te na renga, te na denga, te na çenga!

Ya Rebî kes nizane Tu kusayî!

Ya Rebî Tu guhrindeyê hût î, mendayê qût î, Tu helîm î, melekût î!

Ya Rebî Tu hakimê şe gedayî!

Ya Rebî! Herî hayî, herî hayî, herî hayî!..

*****

***

# Nivêja Rojhilatê

**Bi Navê Yezdanê Pak ê Dilovan û Mihriban**

Ya Rebî! Tu heyî, ez nînim, Tu rehmî, ez guneh, Tu Xudan heqî, ez bende te naçûna, Tu ê çendî, Tu nabejna, Tu ê bilind î, Tu na awaza, Tu ê bi deng î.

Cihê te hemî erde, Tu xaliqê cumleyê 'alem, te daye hedret Adem, te kir dema me ev dem. Ya Rebî Tu ne mîna me dikî dibêjî..

Ya Rebî Tu weliyê ferda nivêjî, Tu rihan ji rihan dipirêjî. Tu ji seran rihan davêjî, Tu ne mîna me kêm dibînî, Tu li seran rihan digihînî. Ya Rebî Tu Xudayî, Tu padişahî, e'lemê 'alimayî, Tu xunkarî, ser çend

padişahanî. Te naxafa, te naxurde, te na awaza, te na denga. Xudan malî, Xudan perde, cihê te hemî erda. Tu Xudayî, derdmend im. Bexşendeyî, bêgunahî, layiqê medh û senayî, kes nizane Tu çawayî?

Tu hem derdî, hem dermanî, hakimê şah û gedayî!

Ya Rebî! Tu padişahî, 'irş û kursî, xaliqê ga û masî.

Ya Rebî bi xatirê navê xwe ke, halê kurdistanê û Êzîdiyên rojhilat û rojavayê bipirse!..

*****

***

# Nivêja Miriyan

**Bi Navê Yezdanê Pak ê Dilovan û Mihriban**

Hey benî Adem! Miskîno! Jaro Ademo! Ev dunya mistanxane ye. Wek xewna şeva ne, felek siha dara ne, hero yara hina ne. Ka silêmanê hukim dikir? Ka Belqîsa nav dikir? Tu jî xweş bî, ewan dunya ji xwe re tirk dikir. Ka silêmanê pêxemberan, ka Belqîsa bi zêrê zeran? Tu ê xweş bî, ew jî çûn nav ax û beran..

Kanî Xidir, kanî Ilyas, kanî derwêşê bi tizbiye û weqas?

Tu ê xweş bî, ew jî di nav axê de kirin qiyas.

Benî Adem, li vê dunyayê mebe tuma, ev zêr û malê gelek meke cuma.

Dunya bo resûlê Xwedê jî nema. Ev dunya erdê derwêş e, ew têde digrin cumleten cêş e. Kesek bi nefsa kubar naçe pêş e.

Kanî Hemze! Kanî Elî! Kanî ewliya! Kanî enbiya! Ew di nav gornê de bûne totiya.

Mala gorinê çende kor e û çende tarî, tijî mar e, tijî mor e.

Ya Rebî! Tu di karî du aşiqan ji êk bikî dûr. Werin, werin xizm û lêzim, wê gavê giriya me bêt, dax û sed kovan û keser, xelqê şêrîn, lêvên şeker nema beden xeber.

Qewî giriya me bê, hizn û girî bêfêde ye, gor û kefen mala me ye.

Megrî, menale, hêstiran ji rûyê xwe bimal, ev dunya bo pêxemberê Xwedê jî nema.

Werin werin, lêzim werin, emê îro gelek bigrîn, xelqê mêrga vemirî.

Heçiya dike ew mîr dike, xêr û şeran xefîr dike, daxa dilan Bapîr dike.

*****

***

# Paşnivêj

**Bi Navê Yezdanê Pak ê Dilovan û Mihriban**

Amîn, amîn, amîn, Xwedê arîkarê dîn.

Ya Rebî xêra tu bidî, şera wergirînî.

Şemsidîn, Fexridîn, 'Îmadidîn, Nasireldîn.

***

Heq û Tu padişahî, Xudanê Mihr û mahî, Rizaqê cin û Insî, Xudayê 'Alema qudsî, xaliqê cin û insî

***

Şerefeldîn xerzê gelî, mizgîniyê bibne Kurdistanê, belavkin deftera îmanê, şîşmis roja Êzîdiyane, Şerefeldîn mîr e li dîwane.

***

Şîlîlxan biketin Kurdistanê, wê topan berditin Turkistanê, textî rakitin bibin Kurdistanê, qeda wê bikevit mala 'Erebistanê.

(Bi dawî hat)

Dilawerê Zengî

كتێبخانا هاوارى

هژمار

٥

# نڤيژين ايزيديان

دجهانێ ده رى يكه ، اوژى رى باراستنى بى يه : زردشت

QUATRE PRIÈRES AUTHENTIQUES,
INÉDITES DES KURDES YÉZIDIS.

مطبعة الترقي

دمشق ١٩٣٣

# بێشکوتنك

اڤـ کتێبو کاها ژبونا بلاڤـ کرنا چند نڤێژین ایزیدیان هاتیه چاپ کرن · مه دل کر کو بڤێ هینجێ ام چند پرسان لسر ایزیدیان بیێژن · د حق ڤان کردین اصیل وخوەروده حتا نهو گلاك تشتین نه ڤنج وخراب هاتنه گوتن · لی دراستی بی ده نه ولی به ·

ایزیدی نه پوتپاریزن ، نه ژی وك گوتنین خلکی ژ تشتکی دن ره دپاریزن · یزیدی ژی وك ملتین دن بین خدان کتێب خدیپاریز و ژ یکبنیا خدی ره باورن · ژو ییڤه ایزیدی د خدی پاریزی بیده ژ هر کسی ژ هر ملت و نژادی کڤنترن · ژبر کو اولا ایزیدی برمابکه اولا زردشته · آیناوان گهارتو یکه آینـا مزدیسنا یانی آینا زردشته وآینا زردشت دیکپاریزی بی ده ژ آینین دن کڤنتره ·

بری کرد حمی زردشتی بون · ژآینا مزدیسناڤه نڤێژ د کرن و ژخوەدی ره دپارستن ، پیشده تر هین بر در کتنا اولین دن گه بدل گه بزور اولین خوه ئین کڤن شمراندن و اولین دن همبیز کرن · هنکان دانه پی فلەتی بی هنان ژی پی مسلمانی بی · ایزیدی لسر اولا خوه سکنین و او برنه دان · لی بڤی نڤی د دورا بابلیسکان ره اولا وان د بن حکمین اولین دن ده هن تشتین خوه وناڤی خوه گهارتن واولا یزیدیان کت حالی خوەئی ایرو ·

نقیژین ایزیدیان نه تنی اڤن کو ام ایرو بلاڤ دکن · ژڤان بگلگی بیترن · ژخوه دِ آیینا مزدیسنا ده — کو ژ اسلامیتی بچند هزار سالان کڤنتره — نقیژ دروژی ده پینج جارانه ·

***

ایرو اڤ کردین اصیل دناڤ مه ده کیم بونه · بکرنی عشیرین کردین ایزیدی اڤن : دنان وسوهانی ( عاموده ) چیلکان ( طور عابدین ، مدیات ، نصیبین ) خالتان ( سعرد ، حکاری ، زوق ، بوطان ) ایزیدیین چیایی ایلونی ( کرد داغ ) رشکان ( تلعفر ) هوبری ، موسانی ( زاخو ) دنان ، برینمه ی ( دهوك ودوراموصلی ) ·

عشیرین ولاتی شیخان : حکاری ، ختاری ، ماومی ، ترك ، قائیدی ، دوملی ، هراقی ، خسکان ·

عشیرین چیایی شنگاری : فقیران ، سموقی ، قیرانی ، هبابان ، هسکا ، مسقورا ، مالا خالتی ، میرگان ، علیفره ، مندکان ·

قدری ( ٥٠٠٠٠ ) یزیدیین ولاتین ققفاس وروانی ·

***

بِ ڤی کرازه بی اُم چارنقیژان بلاڤ دکن · هکه مزن و زانا یین ایزیدیان ژمه ره چند کین دن ژی هنارتن ام وان ژی بلاڤ دکن ·

ژڤان چار نقیژان نقیژا سپیده بی ژمه ره شیخ حیدر بن شیخ نذیر گوتیه · سی یین ماین تقدا ژدڤی اسماعیل بگی ، ژمیر کین یزیدیان ، هاتنه بهیستن و نقیساندن · سپاس وشاباش ژوان مروڤان را کو خدمتا اول وملتی خوه دکن ·

نڤیژا سپیدە یی

## بناڤی یزدانی پاك لی دلوڤان ومهربان

خُدی او ! ژبونا شانی ته ، شوناته ، ژبونا پادشا هبیانه !

یار بی تو کریمی ، تورحیمی ، توخُدایی ، تو ملکی مُلکی جهانی ،

مُلکی سوق وسمایی ، ملکی عرش عظیمی !

یار بی تو ژِ ازلدا قدیمی ! یار بی تا ابد تو کاما روحانی !

یار بی تو مَلکی جن وانسی ، مَلکی عرش و کرسی ! یار بی تو صمدولفتوغنایی !

یار بی تو صمد وحی المجیدی یك ویکتا و بی انبازی

یار بی هر تو لائق مدح وثنایی !

یار بی تو خداوندی سپهری ، خدانی ماه ومهری ، خُدانی چم ونهری !

یار بی تو خداوندی عطایی !

یار بی ته نالوما ، ته نا امدادا ، ته نا آوازا ، ته نارنگا ، ته نا دنگا ، ته ناچنگا !

یار بی کس نزانه تو کُسایی !

یار بی تو کهرنده بی حوتی ، مندایی قوتی ، تو حلیمی ، ملکوتی !

یار بی تو حاکمی شه و گدایی !

یار بی ! هری هایی ، هری حایی ، هری هایی !..

## نفیڕا روژ هلاتی

### بناڤی یزدانی پاك ئی دلوڤان ومهربان

یار بی! توهه یی، از نینم، تو رحمی، از گنه، تو خُدان حق، از بنده
ز، ناچونا، توئی چندی، تو نابژنا، تو ئی بلندی، تو نا آوازا، توئی بدنگی .
جهی نه همی ارده، تو خالقی جمله یی عالم، ته دایه حضرت آدم،
ته کردمامه اڤ دم . یار بی تو نه مینامه دکی دیژی . . .
یار بی تو ولی یی فرضا نڤیژی، تو رِحان ژِ رحان دپر یژی .
تو ژِ میران رِحان داڤیژی، تو، میامه کیم دبینی، تو لِ میران رِحان د گهینی
یار بی تو خُدایی، تو پادشاهی، اعلمی علایی، تو خُنکاری، میر چند
پادشاهانی . ته ناخافا، ته ناخُرده ته نا آوازا، ته نادنگا .
خُدان مالی، خُدان پرده، جهی ته همی ارده . تو خُدایی، درد مندم .
بخشنده یی، بیگُناهی، لایقی مدح وثنایی، کس نزانه تو چاوایی؟
تو هم دردی، هم درمانی، حاکمی شاه و گدایی!
یار بی! تو پادشاهی، عرش و کرمی، خالقی گا وماسی .
یار بی بِر خاطری ناڤی خوه که، حالی کردستانی و
یزیدی ببن روژ هلات و روژ آڤایی بپرسه!. . .

—٦—

نڤیژا مریان

## بناڤی یزدانی پاك ئی دلوڤان و مهربان

هی بنی آدمو ! مسکینو ! ژارو آدمو ! أڤ دنیا مستانخانه یه .
وك خوناشڤانه ، فلك سها دارانه ، هرو یارا هنانه
کا سلیمانی حکم د کر ؟ کا بلقیسا ناڤ د کر ؟
نو ژی خوش بی ، اوان دنیاژخوه ره ترك د کر
کاسلیمانی پیخمبران ، کا بلقیسا برِ زیری زران ؟
تو ئی خوش بی ، أو ژی چون ناڤ آخ و بران ...
کانی خضر ، کانی الیاس ، کانی درویشی برِ تزبیه و وقاس ؟
تو ئی خوش بی ، او ژی دناڤ آخی ده کرن قیاس .
بنی آدم ، ل ڤی دنیابی مبه طما ، أڤ زیر ومالی گلك مکه جما .
دنیا بو رسولی خُدیٔ ژی نه ما . اڤ دنیا اردی درویشه ،
او نیده د گرن جملةً جیشه . کسك برِ نفسا کبار ناچه پیشه .
کانی حمزه ! کانی علی ! کانی اولیا ! کانی انبیا ! أو دِ ناڤ گورنی دهبونه توتیا .
مالا گورنی چنده کوره وچنده تاری ، تژی ماره ، تژی موره .
یاربی ! تو د کاری دو عاشقان ژِ یك بکیدور . ورن ، ورن خزمِ ولیزم ، وی گاڤی
گر بیا مه بیت ، داغ و صد کوڤان و کسر ، خلقی شیرین ، لیڤین شکر نما بدن خبر .
فوی گر بیا مه بی ، حزن و گری بیفیده یه ، گور و کفن مالامه یه .
مگری ، منال ، هیستران ژِ روبی خوه مال ، اڤ دنیا بو پیخمبری خُدیٔ ژی نهما .
ورن ورن ، لیزم ورن ، امی ایرو گلك بگرین ، خلقی میر گا قمری .
حچیبا د که او ببرد که ، خیر وشران غنیر د که ، داتا دلان باپیرد که .

— ٧ —

پاشنڤیژ

## بناڤێ یزدانی پاك ئی دلوڤان ومهربان

آمین ، آمین ، آمین ، خُدی آربکاری دین ·

یاربی خیرا توبدی ، شرا ور گربنی ·

شمس الدین ، فخر الدین ، عماد الدین ، ناصر الدین ·

***

حقو ، تو پادشاهی ، خُدانی مهر و ماهی ، رزاقی جن و انسی ،
خُدایی عالما قدمی ، خالقی جن وانسی ·

***

شرف الدین غرزی گلی ، مزگینی بی بینی کردستانی ، بلا ڤکن دفترا
ایمانی ، شیشمس روژا ایزبدییانه ، شرف الدین میره لِ دیوانه ·

***

شیلیلفان بکتن کردستانی ، وی طو یان بردن تور کستانی ، تختی
را کتن بین کردستانی ، قداوی بکڤت مالا عربستانی ·